

# BERBANG

KOVARA FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ LI SWÊD

GEDE KURD,

CAWEKI XWE YÊ MEŞIN

YILMAZ GÜNEY

HUNDA KIR

## NAVEROK

12 Îlon Roja-Reş.....	3
Protestoya Cunta Faşist. ....	4
Êrişa leşkerên Tirk .....	5
êrişeke Reş .....	6
Yılmaz Güney .....	8
Sûcê giran.. .....	9
Hevpeyvîn bi Ferhad	
Shakely (Şakîli)re .....	12
Oî di Kurdistanê de .....	14
Proja Kurd .....	17
Hin buyerên zîman.....	18
Birindar û çavêş. ....	21
Hunerên bûkê. ....	22

○

**Berpûrsiyar**  
**S. FERMAN**

**Pergala Rûpelan**  
**A. M. GILLY**

**Raxistina Nivîsaran**  
**RÛŞEN**

**Redaksiyon**  
**KEYXUSRO SÎPAN**  
**BENGÎN BOTANÎ**  
**A. M. GILLY**  
**RÛŞEN FARQIN**

**B E R B A N G**

Kurdisk tidskrift, utges av  
Kurdiska Riksförbundet. Ansv-  
arig utgivare och Redaktör:  
S. Ferman- Layout: A.M. Gilly-  
Sättning: Rûşen.

**A D R E S S**

*Kurdiska Riksförbundet,*  
**RISSNELEDEN 55,NB**  
**172 44 SUNDBYBERG/SWEDEN**  
**TEL:08/984553**

*Prenumerationsort: Medlemmar*  
*50.- kr/år Övriga 100.-kr/år.*

*Postgiro: 64 38 80-8*

## XWENDEVANÊN HÊJA!

Jî ber ku Federasyona me barkiriye Lokala xwe ya nû,  
navnişan û telefona me ji hatiye guhertin.

Navnişan û telefona me ya nû li jêrê ye.

**RISSNELEDEN 55.NB**  
**172 44 SUNDBYBERG/SWEDEN**

**TEL.08/984553**

**Cihê Lokalê :L1 Hallonbergenê ye.**

**BERBANG**

**B E R B A N G**

Kovara Kurdî, Xwedi:Fede-  
rasyona Komelên Kurdistanê  
Li Swêd.  
Buha: 5 Kron.  
Abona saleke:50 Kron,30 DM.

**N A V N I Ş A N**

Berbang,Rissneleden 55.NB  
172 44 SUNDBYBERG/SWEDEN  
Tel: 08/984553  
Postgiro:64 38 80-8

# 12 İLON – ROJA REŞ,

## BIKIN ROJA YEKİTIYÊ

4 sal berê, di 12'ê Ilona 1980 de generalên faşist bi dara zorê hatin ser hukum, ku bi dara zorê tevgera gelên kurd û tirk bîdî rawestan, hêz û hişyarbûna gel rawestînin, bişkinin.

Generalên faşist, di 1971 an de ji hukum bi zorê girtbûn destên xwe û rêxistinên pêşverû yê nî siyasî û demokratîk qedexekiribûn, kesên pêşverû, şoreşger avêtibûn nav zindanan. Ew çax ji sermayedar bi destên faşistên hov, ev hişyari û pêşketinê ji bo demê kî dan rawestan, gelek hêz belav bûn, endam û dîlxwazên rêxistinên ketin nav rewşeke xirab. Lê belê nizama diyalektîkê li welatê me ji meşiya, tevgera gel ji nû ve gulveda, kûrtir û firehtir bû, bejn da. Weke ku pêşiya avê bi bendekê bê girtin ji bo ku neherike, Lê çawa di demê pêşverûyê di hêdi gol dibe û qeyd û bendên xwe diqetîne davêje, tevgera gel ji wulo; gol bû û bendên xwe qetand hê xurtir meşiya. Piştî 1974 an tevgera gel xurt bû, hişyari pêşket. Karker û belengaz xwe hêz kirin, tekoşin dan. Pîrsa gelê kurd giha her cih, bir û baweriyên welatparêzî gelek pêş ket. Rojname û kovarên kurdi derketin, grev, meş, boykot gêş bûn, welat bû du perçe, alî şoreşgeran û alî faşistan. Sosyal Demokrasiya Tirkîyê di

navbera her du alîyan da çû-hat, ta ku perçe bû, ji hev ket

Sermayedar, bi tevkariya emperyalîstan vê ji alîki faşistan xwedi kir, ji alîki va ji xebiti ku hin rêxistin di rêke çewt de bimeşe. Hevdu kuştin şoreşgeran qels xist, Lê faşist pêş ketin.

Yekitiyê xurt pêk nehatin. Generalên faşist bê berxwedan hukum girtin destên xwe û bi hovîti êrişê şoreşger û pêşverûyan kirin û dîkin. Gelek şoreşger li kuçan û zindanan hatin kuştin.

Ji 1980 vir de demeke tari, diwar destpêkir. Rêxistin bi birinên kûr, an perçe bûn, an ji belav bûn. Demeke bê umûdi dest pêkir. Peywendî bi welat re sist ket.

Lê faşist di vê demê de tim pêş ve neçûn. Zordestiya wan yê nî siyasî û aborî her dom dibe. Dengên karkeran û kesên pêşverû û demokrat bilind dibe, tirs dîşkên.

Dijmîn sist dîkeve imkanên pêşiya şoreşgeran zêdetir dibe. Yekbûn iroj ji her roj giringtir. Divê gel me bibise, divê gelê cihanê me bibise! Deng bi yekbûn derdikeve. Çawa gelê me dibê yekbîn em bi we re. Gelê cihanê ji dibêjm; yekbîn em bi we re.

*S. ferman*

# cunta faşist hat protesto kırın

Ji 1980 virda, hersal dema ku 12 ê İlonê tê, kesên şoreşger, welatparêz, pêşverû yên ku welatên xwe ji ber reşayiya, zulm û zordestiya vê rojê bî xwere aniye terk kirine, li dervayi welat dıciyin, bî hevra dışewirın, ji bona pişgirtî û hevkarîyên hê bî hêzîr dımeşın. Vê roja reş û guhertinên pêra çêbûn protesto dıkın, dırcımın. Her sal hin bî hêzîr li hember cunta faşist dısekımın.

İsal ji li ser hatına 4.saliya 12'ê İlonê û hukmê faşist, tevger û kesên welatparêz yên Kurd û Tirk li Swêd li bajarê Stockholmê meşek bî beşdarbûna 800 kesi pêk anin.

Federasyona Komelên Kurdistan li Swêd ji bî 17 komelên endam û kesên xwe beşdari protestokırına vê rojê bû. û dı meşê de ciyê xwe bî giringi girt.

Li gel vê, gelek rêxistin û komelên dın yên Kurd û Tirk dı meşê de beşdar bûn weke İSTİB,

Devrimci İşçi, (Karkerê Şoreşger) Sosyalist Gazetesi (rojname Sosyalist), Uppsala-Kürt ve Türk Halklarıyla dayanışma Kom. (Komita pişgirtiya gelên Kurt û Tirk li Uppsala), Kurdistan Kultur Centrum (Merkeza Kultur ya Kurdistan), İşçi Gerçeği (Rastiya Karker), Roja Welatla Dayanışma Kom. (Komita pişgirtiyê bî Roja Welat re).

Weki dın, Parti û Oraganizasyonên Swêdi ji dı meşê de bî axaftinên xwe beşdar bûn. Cûntaya faşist û hukumeta wi ya Özali mehkuş kırın.

Meş ji meydana Sergelstorg (meydanek li nava Stockholmê) dest pê kır heta konsolosa (sefaret) Tirka domkır. Li ber konsolosa ji, slogan hatın avêtın û axaftina protestoyê çê bû. Dı axaftinê de li ser giringiya hevkarî, û pişgiriye li hember diktatoriya faşist hate sekınandin. Meş bî dısiplinek mezm û serfirazi der bas bû.



Parlamentêrê sosyal democrat  
Hans Goran Frank dıaxife.





# ÊRÎŞA

## LEŞKERÊN TIRK

### dî 15ê ilonê de li Stocholm hat protesto kirin

#### AXAFTINA MEŞÊ

Dî 15ê Tebaxê de Leşkerên Tirk êrişeke nû birin ser Kurdistana Iraqê, ketin nav sinorên Kurdistana Îranê û hendamek mezin li Kurdistana Tirkîyê hawirdor girtin. Leşkerên taybeti yê dij gerillayê ji Qeyseri, Bolu û Batmanê anin vê hîdamê, ku zulm û zordestiyên bê hempa, qetliamê mezin pêk bînin. Ev hîdam ji hawirdor hat girtin, ku qetliama xwe bi hêsani pêk bînin, nehêlin deng ji vê hîdamê derkeve derva. Wezirê dervayê yê Tirkîyê di beyana xwe de tirsaxwe ani ziman, ku deng ji vê hîdamê derkeve der û bi gîhê dînyayê. Ji bo vê yekê gelek grînge ku hukumeta Swêd lezke pêşiya vê qetliamê bigre. Weki xeberên tîyî heta nuha

gelek kes hatine kuştin.

Rejîma Faşîst a Tirkîyê dereweke xwe yê kevn disa bi kar tîne, dibê ku 'em di vê hîdamê de li terorîstan û sêparatîstan dîgerin". Bi vê awayê dixwazin qetliamên xwe meşrû bikin.

Divê mirov bîpîrse, ma gelo ji bona kuştina du leşkerên Tirk li Eruhê çima hemû hîdam ji hawirdor tê girtin û nahêlin deng û behs ji wê derê derkeve derva.

Lê armanca wan a rasti xuyaye

Sê roj beriya vê êrişê serokê NATO yê General Rogers, li Tirkîyê bû û bê şik ev yeka bi razibûna NATO yê pêk hat. Disa di vê demê de rejîma Îranê di

xebatê de ye ku ji rojavayê Kurdistana Îranê yanzde hezar kurd derke û vê hîdamê bike hîdameki leşkerî. Ev yekitiyeke di-rokiye, ku dijminên gelê kurd carek din bi kar tînin û ji her aliyê li gelê kurd dixin

Her usa rejîma faşîst a Tirkîyê bi vê êrişaxwe va dixwaze dengê doz û daxwaza demokrasiyê bîbire. Dî vê sala dawî de dengê karkerên Tirkîyê hê bilintir bû. Nuha li her derê Tirkîyê li dij faşîzmê deng bilind dibin. 1263 rewşenbîrên demokrat beyane ke dij faşîzmê derxistin, doza demokrasiyê kirin.

Em ji hukumeta Swêd daxwaz dikin, ku dengê xwe bilind bike nehêle van hovên faşîst gelê kurd qetil bikin.

# ÊRÎŞEKE REŞ

navê Roma Reş li ser zimanê gelê kurd hertim ji bo zordesti, xwinriji û zilmê hat xebitandin. Sed salan vir da, ji dewra Osmanliya bigrin hetani roja iroyin ev rengê qirê t nehat guhêrandin, hertim reş ma.

Panzdeh tebaxê vir da li ser Provakasyoneke eşkere hukumeta tırka hêzên xwe yê mezin yê leşkeri carke din ajotin ser axa Kurdistanê û şereki mezin vekirin gelê me ra. Iro gelek gund, bajar û çyan, bî eskerê Roma Reş va çar ali hatiye girtin. Kuştin, lê dan û girtin hertim berde-wam e.

Van çend salên dawiyê, nemaze pey hukmê leşkeri, planên ser rojhulata navin dhatin ajotin, êdi zêdetir ber çav bûn. Ev herema iro bo erîşê Emerikayê bûye hedefeke yekemin. Tegera gelê Rojhulata Navin ya aşitixwaz û serbixwe, çavê kevneperesta û Emerikayê da bûye istiriki tûj. Dî vi wari da tevgera gelê kurd ya azadixwaz ciki taybeti digre.

SERDAR

Iro li ser axa Kurdistana Iran û Iraqê şereki çekdari tê ajotin. Li Iranê gelê kurd bo mafên xwe nêziki pênc salaye ku bi qehremani berxwe dide û derbê n mezin dighine dijmin. Ev yeka ne tenê bo xwinrijên Iranê, usa bi Roma reş ji tirseke mezin e.

Baş tê zanin ku tevgera gelê kurd, di perçeki tenê da ji big hêje armanca xwe. Yê statukoya Rojhilata Navin da guherîne ke mezin pêk bine. Bo vê yekê ji dijmin hişyar û êrişkar e.

Ev şer û êriş buyerên dirokine. Parvekirina Kurdistanê dilê gelê kurd da kulek û yê dijmin da tirs û xofek hişt. Ev kul û xof bi hevra mezin bûn. Serhildanê gelê kurd li ser vi himi, êriş û hovitiya dijmin li ser vi sedemeki hat ghişte vê rojê.

Ev bûyer hertim kete nav planên karbidestê kolonyalista û emperyalista. Iro li ser axa Kurdistanê sê aliyê da êrişê dijmin ghiştin hev. Armanç eşkereye: Pêwiste tekoşina gelê kurd bê şikandin.

Berya êrişa tirk, hikumeta Iranê da kifşkirinê ku ordiya Iranê bo êrişê mezin tivdareke xwe dîke û here ser Kurdistanê, wezirê Iranê yê derva, xwe zutirkê gihande Enqerê. Piştî serokê ordiya Nato yê Rogers hat Tirkîyê. Navbeyna Rogers û karbidestên Tirkîyê va gelek danustandinên veşarti derbaz bûn.

Pey van dek û dolaban va, li Erûh û Şemdinliyê du leşkerê tirk hatin kuştin çendek ji hatin birindar kirin.

Pey vê yekê hikumeta tirk û organên propagandayê, bi dengekî bilind û şoveni va seferê xaçliya vekirin û bi tank-top û hêzên xwe yê komando va avêtin ser gelê Kurdistanê. Ew ko-

mandoyên har ku, bi şev û roj, ser û meziyên wan bi dijminantiya kurdan tê tiji kirin û bo kuştin û pelixandina gelê kurd hini şer dabin. Disa bi hovitiyê bajar û gundan malan talan kirin çiqas zilm û zordari heye paştî nehiştin. Hezaran kes girtin û avêtin işkencexanan, dehan kes hatin kuştin sedan gund hatin valakirin. Ev yeka bes ne ditim ajotin ser axa Kurdistana Iranê Peşmerge nav du agira da man. Gelek kes hatin girtin û kuştin. Gelek ciyên stratejîk bi êrişa tirk va ketin bin kontrola eskerê Iranê.

Rojnama Îngiliz 'The Guardian' û ajansa 'BBC' yê dane kifşkirinê ku êrişa ordiya tirk û ya Iranê bi hevra eyni rojê destpêkir û bi hevra avêtin ser Kurdistanê. Disa hemû ajansên dinê wek Alman DPA, Franc Prees û ya Emerika Yekbûyi UPÎ didime

xuyakirin ku, ordiya tirk, bi destûra hikumeta Iran û Iraqê va pênci(50) km ketiye axa Kurdistanê Iran û Iraqê.

Gelê Kurdistanê Iranê nêzi pênc salane, ber teqê reqa top û tiringan, gure gura balafiran û pasdarên xwinxwar stuyê xwe xwar nekir û welatê xwe bi merrani parast.

Bi bir û baweriyên me, ev provakasyona û ev êrişa bi dijmin bû fersendeke taybeti ku, erişê xwe bighinin ser Kurdistanê Iranê û hêzên welatparêz bîşkinin bi vi tehri karê hikumeta Iranê ye xwinrij hêsa bikin.

Aliyê din da hikumeta tirk va bin serokatîya Ozal da, di warê abori û siyasî da ketiye astengekê. Aboriya Tirkîyê roj bi roj ber bi xerabûn, tunebûn û tariyê da diçe. Ne tenê kesên diji rejîma faşist û hikumeta wê, usa ji kapitalistên mezin yê ku Ozal bi destê xwe va anibûn ser hu-

kim, ewana ji iro nerazibûna xwe didime kifşkirinê û diji ekonomî-polîtîka Ozal radiwestin.

Disa hêzên emperyalistê navnetewî yê warê abori da alîkarîke mezin nişani hikumeta tirk dan, nemaze IMF, OECD, Banka Dinê û hwd. Li ser rewşa Tirkîyê pîr gazin kirin. Ji bo alîkarîke nû, gelek şertên nû û dijwar peşneyar dikin.

Ev bûyer abori û siyasî, krîzên here mezin pêk tîne. Ev yek li ser karker, gundi û gelê Kurdistanê tesîreke mezin çêdike. Keleke ciwaki hêdi hêdi dengê xwe dide bihistin. Krîz ne muweqqet e, ev krîz bîngehiye.

Çawa tê zanin ku peyvendiya Emerika Yekbûyi û karbidestên tirk gihşte merhalek nû. Iro li dinê da tu tişt wek çekên atomîk (pershing û Cruis) ne aktuel e. Cih bûna wan, li her der bû sedemê opozîsyonê mezin. Ji bo cih kirina çekên atomîk û hêzên lezkirî Rojhilata Navin da, Tirkîyê û Kurdistan warê stratejîk û jeopolîtîk da ciki girîng digrin.

Ev provakasyona eşkere û zanisti bu sedem ku, dijmin li gor planên xwe eriş û zilma xwe zêdetir bine ser gelê kurd û welatê me bike wargeheki leşkerî û tekoşina gelê me bipelçiqîne.

Bo dijmin nikaribe tevgera gelê kurd bîşkê ne pêwiste hemû hêzên welatparêz û pêşverû li ber van provakasyonan û êrişa rawestin.

Rojên nêz da bi yekiti û tekoşina gelê me va, êdi li ser welatê me, xeberên mirin zilm û zordestiyê na, yê xweşi, dosti û aşitiyê belav bînin.

# YILMAZ GÜNEY

## ÇÛ HEQÎYA XWE

### Bengin Botani

Rejisorê kurd Yılmaz Güney di roja 9.9 1984'an da li Parisê di 53 saliya xwe de çû li ser heqîya xwe. Mîrîna Yılmaz Güney, di salên xortaniya xwe da, bi rasti jî bo sinema huner û çanda kurdi bû valahikê mezûn û mirov zû bi zû nîkare vê valahiya mezûn tîji bike. Cenazê wi, di roja 13.9 1984'an li Parisê di goriştana bi navê 'Pere Lachaise' da hate definkirin û bi hezaran kesên kurd û biyani tevi şîna wi bûn. Çawa rojnama û radyoyan diyar kir weki nêzkaya 3 hezar kesan di vê şîne da cih girtin.

Yılmaz Güney, di sala 1931 an li bajareki Kurdistanê Siverekê hate dîmê, dê bavê wi kurd bûn. Di sala 1955 da wi xwendegêh a navin qedand û gelek salan li bajarê Edenê ma. Di nav van salan da bi navê Yılmaz Pütün (navê wi yê rasti) dest bi çiroknivîsandinê dîke. Di sala 1958 an da jî dest bi listîkvaniya sinemayê dîke. Edî li pêşîya Yılmaz Güney dergehên nû vedibin, perdeyên spi, sinema, film, listîkvani û rejîsori. Ew xwe di nav kareki dîr-dirêj da dibîne. Paşê navê wi ne tenê li Kurdistanê û li Tirkîyê navê wi li hemû cihanê belav dibe.

Yılmaz Güney ne tenê film çêkir, listîkvan û rejîsor bû. Ew wusan jî nivîskareki bi nav û deng bû. Di roman û serpehatiyên wi da, di senaryoyê wi da hertim tekoşîna ordiya zehmet kêşan karkeran bû belengazan zêndî û jindar maye. Cara pêşîn romaneke wi ya bi hêja 'Ew bi stuxwari mîrîm' jî ber navdariya xwe di sala 1972'an da hêjayî

xelata Orhan Kemal dibe. jî der vê romanê çend pirtûkên wi di-sa li Tirkîyê hatin çapkirin, wek 'jî kurê min ra çend name' (1979), 'Sobe, şûşa pencerê û Em Du Nana Dîxwazî' (1980)

Yılmaz Güney çawa tê zanin bi taybeti wek rejîsor nivîskarê senaryoyan, listîkvanê sinemayê û wek filmçêkir tê zanin. Nema di nav salên 1970'an da Yılmaz Güney naveroka filmên xwe hêdi-hêdi destpêdike diguherîne. Pîrsên civaki, netewî, pîrsên karkeran, gundiyan êş-janên wan dibin babetên naveroka filmên wi jî ber vê guherandî û rêhildanê. Ew di sala 1972 an da li Tirkîyê hat hilbijartin wek 'Hunermendê sala 1972'

Yılmaz Güney heta roja mîrîna xwe jî li ser karên xwe bû. Ew gelek jêhati efrandar û di warê sinemayê da keseki gelek serfiraz bû. Wi gelek film çêkir, Senaryoya wan nivîsi û bû rejîsorê wan. Di nav filmên wi da, filmên bi nav û deng evin: Rê, Diwar, Tîrs Zakonên sinoran, Heval Keri û gelekên mayin. Jî vana filmên Rê û Diwar li dervayî welat hatin çêkirin.

Bi taybeti bi filmê Yol (rê) va, navê Yılmaz Güney li hemû cihanê belav bû. jî ber ku, ev filma jî ber hêja bûna xwe xelata 'şahiya filman li Cannesê' girt. Bi mehan ev, filma li hemû ewrûpa hat nişandan, bi milyonan kes bala xwe keşande li ser rewşa Kurdistanê, rewşa girtîyan, jinan, zarokan û zordestiyên li ser

gelê kurd. Girtîna xelata Cannes di sala 1982 an da navê Yılmaz Güney hun jî li cihanê belav kir.

Jî ber filmê rê hêjayî xelata Cannes bû. Jî ber ku filmê rê li ser dubendiyên tûj li Kurdistanê Tirkîyê sekîni bû. Ew dubendiyên (tezat) ku mirovên destpiyên wan bend kiribûn ew xîstibûn di nav çar diwaran. Ev realitiyên (rastiye) li Kurdistanê bi kiraskirî, veşartî, jî aliyê Yılmaz Güney da derketin ronahiyê. Jî aliyê din da jê hatiya Yılmaz Güney, di warê sinemayê da jî, di warê girtîna vê xelatê da roleke mezûn list. Filmê rê wusan jî qedexeyên li ser zîman û çanda kurdi qelaşt girt avêt, ev filma bû kulmek li suretên kolonyalîstan ket. Jî ber vê yekê jî, kolonyalîstên Tirk nehiştin weki ev filma li Kurdistanê û li Tirkîyê bê nişandan. Tîrsa wan mezûn bû, jî perdeyên spi... jî Yılmaz Güney. Jî ber vê tîrs û xofa mezûn kolonyalîstan tam 12 sal Yılmaz Güney di girtige-

hê da hiştin. Lê ew bêdeng nema, ne tîrsiya, hêviya xwe jî rojên xweş nebiri, rûmeta xwe wînda nekîr.

Yılmaz Güney, di nav van salên dawîna da giraniya xwe bi taybeti danibû li ser pîrsa kurdan, bi pîrsan kurdan va gelek mijul dibû, xwenasiya netewî welatparêzî propagandaya li ser Kurdistanê li Fransê bi destê Yılmaz Güney bi tehreki qenc û çê dihate ajotin. Bo vê yekê jî wi di nav rêza hûmdarên sazîrîna 'Enstituya Kurdî li Parisê' da cih girt.



# SÛCÊ GIRAN

Mirza Bextiyar

Cemşit xortek şanzdeh sali, hê dû mehê wi neqediya bû, kû dest bî lise (bakelorya, Gemnasium) yê kırı bû. Lî dibistanê û bajêr kesek tune bû, wi nas neke. Lewra lî dibistanê, çî bêje lî gışti bajêrde. Ji wi qelstir kes tûnebû. Dema işlikek tenik lî xwe dîkir mirov karîbû parsiyê wi bijmarta. Ji xwe ji çerm û hesti pêk hatibû. Berçavik lî ber çavê wi, bî kê mani pênc numre bû.

Lê, ji jêhat bûna wira gotin tunebû. Ne tenê emsalê wi, kesê safa dawin ji pêra seri dernediketin. Gelek dîxwend. waxtê wi bî pîrani lî pirtûkxanê derbas dibû. Ew xwendina wi ne tenê lî ser dersa bû. Hema çî bîdita radîhêşt dîxwend. Her roj vegera dibistanê diçû ba terzi İsmet, radîhêşt rojnama rojek berê û berê xwe dîda malê. Ji derû cîrana bigre hevalbendê wi yê dibistanê, kesi jê acz be, nexweş-be tune bû. Lawikek şûna xwe

da helim, ne belakir, ji şer dûrbû. Kesi nikarîbû şahıdayi bîde kû Cemşit û yeki lihevxiştîbî an ji pevçûbî.

Weki her roj wê rojê ji bî gotina diya xwe werqîlî kû seet yanzdeh e. Zû zûka firavina xwe xwar, serê xwe pêl kir berê xwe da dibistanê.

Dema tenê bî rêva biçûna, haya wi ji dora wi ne dîma, laşê wi lî wêderê dîma, heşê wi ya diçû deh sal berê an ji bist sal şûn ve.

Bî dengê Cemil şîpara ziviri -merheba pênc deqeye kû lî dû teme, mîn te bî şêlanda ji tu bî xwe nedihesiya yi. Em dereng mane, piçek lez bike!

Na lo! Dersa Şemsetin xoce ye, neha nehatiye, belki ji qet neyê. Nanêri! çî taveki xweşe, sedi sed çîye seha minê mektebê. Rîhê wi dî topê daye.

Erê law! Heqeten ji çî taveki xweşe. Meha Kasimê (çîriya paşin) da, vê tavê! heyret. Xwezka xoce nehata, me xwe bîda berberoşk. Ha! mîn hê bir nekîriye ez wê pirtûka te ji birê mîn xwestibû, bîdim te. Mîn do ba nîna malê, lê karê mîn derket,

ez nehatim.

Hatî dibistanê, hîlkîşîyan jorê, sînfê (qawîş) nê hêrin, bî rasti ji hê mamoste yê wan nehatiye. Xeyni dû keçîka xwendevanan ji yek xwiya nedîkir. Devê Cemil beşrin:

Hê em tenê ne, xoce bêji bî me tenê dersê nake. Cemşit! hadê em derkevîm hewşê.

Na wele ez dîkîm herîm Kutupxanê (pirtûkxane). Lî kuçê ziviri.

Zeynep! qe xeyni me kes nehatiye?

Tu çenteyê lî ser maseya navîni Çend deqê lî hêviya xoce man, xoce nehat, ew ji çûn topê bîlêyîzî.

Xoce qet nehat?

Na.

Cemşit çû pirtûkxanê. Slav da nivistan û rûnişt dest bî xwendina pirtûkê xwe kir. Piştî saetek Kazîm hat kêlekê runişt çend deqê nema rabû. Bî hatîna Kazîm nehesiya, lê bî rabûna wi ya bî lez hîsiya. Dî dilê xwe da

got: xwedê zane ica kitap(pirtûk) bir, qaşo bi xweyne.

Kazım, pistirinê dersxanê bû. Ji bo xwe têxe çavê mamosteyan çî bêji dikir. Carna sê-çar pirtûk dehat dibir nişê mamoste dida, qaşî xwendiyê, çavnebar bû. Yek jê jê hatir hebûna hezar leke tani serê İftira, vir, fesadi û her tiştê ne qenc jê dehat.

Kazım bi deri girtina pirtûkxanê bazda jêrê. Wisa bi bazdanek dîçû, kû bi wan gavên xwe yê nî pîçûk û laşê xwe yê gir, çar çaplûka bi yek carki da qebaz dida. Paplûka dawi da pê yê wi ritimî. Li ser devû poz diket, li ser bextê wi ra mamoste Eşref derket, li wi qelbi.

Mamoste Eşref bi hêrs:

Deve, heywan, çî hewara te ye? Ma eskerê Rûs daye du te?

Kazım bi "xocam (mamoste yê min) xocamê" gotina wi buri. Lê, ji ber binefîşka serda avêti, her gotinek xwe du sê car dikir. Devê xwe kiribû devê mamoste û piste pista wi bû. Bi vê piste pistê, ser çavê mamoste yê tîrş kirî hêdi hêdi diguhuri, şûna wi awirên bi ecêb girt, Çavên wi ji çavên ga ji girtir bûn û bi dîwarê hember va eliqî mat ma. Hê axaftina wi baş ne qediya bû, mamoste bi çepî wi girt, bi gavên gir bi ber oda berpîrsiyarê giştî ve çû. Gav avêtina wi xwezokî lê serê wi bi fîkare bû. Ne tam bawer bû ku tiştê Kazım gotibû, rast be, lewra çar sale kû mamosteye hê rasti bûyerên weha ne bihistibû. Dema nêzi odê bû gavê xwe hur kir, li Kazım fetilî;

Ne vir be ha!

Wele raste ez rast divêjim.

Bi dest avêtina deri va qırîka (gewri) xwe paqj kir, li odê dîsê mamostên din ji hebûn. Slav da wan û weki tiştê tunebe, bi gavê bê armanc, beredayî ber bi

tawla berpîrsiyarê giştî çû, gi-handîna ber tawî ve xwe xwar kir, di guhê wi da got: Her çiqas berpîrsiyar nexwesta bîda derva ji, avêtina bibikê wi û yek car ki da vegera serê wi da, mirov dîzanihi ku tiştê ecêp bihist. Lê berpîrsiyar, tafîlê xwe tevda got:

Mamosteyê min fermo, ewa rûnê. Bi destê xwe îşaret da dengêk mîzmîk got: Temame, ez hel bîkîm.

Aşîkar bû kû, bawerîya xwe bi dora xwe nedani, Lê mamoste Eşref xweş nasdikir. Mamoste ketin sohbetê. Kazım bir kirî-

bûn. Ew ji nîzan bû ku derkeve an bîsekîne. Heyecana û bazdana hêja xweydan li ser çavê wi ketibû. qasê carki pozê xwe dikşand, dibû fîra fîra wi. Her cara rîyê mamosteya bali wi da bîzîvîriya, devê xwe beş dikir. Lê haya kesî jê nema bû. Ew ji hê hîri yek jêra tiştê nabêje, paxavê pê nake serê xwexwarkir, hêdika deri vekir û derket derva.

Çend deqê nebûhîri zengîl lê ket. Bi zengîlê dîduyan ve mamoste gişt derketin. Mamoste Eşref ji kirîna derketa, bi dengê berpîrsiyarê giştî sekîni

Devê wi mendalê bigre heta polis werin.

Berpîrsiyarê giştî çû ser telefonê mamoste Eşref ji, derket jêrê. Lê heta gîhişt dersxanê, Kazım, sê-çar kesan li dor xwe kom kiribû û qelebalîxa wan bû. Nava wan de raberzînek niv şer dom dikir. Yek-duduya di got.

Na law! viya iftiraye, ji bo xwe têxe çavê mamosteya derewek nû ye. Ev tişt û Cemşî!.. Dunyayê de nabe!..

Yek ji digot!

Dibe, dibe! Sosretê mezî kesê awa dikim. Edî ez carek din pêra xebnadim heyra!..

Bi hatina mamoste Eşref gişt ciyê xwe girtin. Cemşî ji weka teva li dersxanê ciyê xwe girt. Mamoste Eşref piştî navxwendîne dest bi dersê kir. Lê herdû deqa carki li şîbakê dînehîri. Te bati bi Kazım ji nediket. Çavê wi ji mamoste Eşref nedîqetîya. Dîfikîrî ha bi Cemşîd girt ha pê girt.

Ew deqê derengi neket, dengê cib û texsiyên polis hat. Lê derwayî mamoste yek nîzanibû, qa-seki din polis derê dersxanê vekin. Cara paşîn mamoste, hê Cemşîd dînehîri, derê dersxanê hat lê xîstî ji polisek bi çekê sîvil ket hundir. Ji mamoste pîrsî-

Min bîbore, Cemşîd Aycan kîye?

Mamoste got fermo" û bi desta wi îşaret kir. Xwendevan hê di şaşmayî hatina polîsan da bûn, bi birîna Cemşîd cara duduyan şaş man.

Cemşîd hê negihîştibû deri, polisek ji devê deri dest avêtê, alî xwe da kîşand serda ji tepek avêtê. Cemşîd şîşê erdê bû. Qarînek wisa jê çû, kû dilê gurê serê çîya ji karîbû bi êşanda. Peyra du polis bi çepîlê wi girtin, di derencê da niv kîşandi niv li hewa hêlkîrin û birin, li cibê sîwar kîrin. Du polis li pişt dudo li pêşî sîwarbûn, yek ji li kêlekê. Mîsê wîha ji lê dîxîstî. Kuzek kuzek jê dîçû, dil û kezev bi merîva nedîhişt. Lê, polis ne meriv bûn kû dilê wan bi êşe, ji gurê serê çîya ji bê ujdantîrbûn.

Li aliyê din de gişt xwendevan bazdabûn ser kursiyên ber şîbakê. Pêşî, mamoste xwest wan bîsekînine. Lê, neherî gotina wi pere nekîr, sekîni, wan serbest hêşt. Xwendevan gişt mat mabûn, li cibê dînehîrin, çîti ji wan dernediket. Dersxane tu car awa bê deng nemabû, carcarîna piyê wan li kursî diket, bê dengî xera bîkîra ji, ev deng we-

ka ambarek serû bini û valada,  
wek şıpina dılopek, sar û bıyani  
bû. Axaftın, devê yeki nediket.  
Mırov dıgot qey gışt lalın an ji  
axaftınê bira kırine. Piyê zeyne-  
ba nazık bê hemdi her çıqas hat  
pêlkırın ji, çıt jê derneket. Ew  
Zeyneb kû, dema deri şıd dehat  
vekirın qêjin jê dıçû.

Cib û texsiyên polisa çû ji, ne  
yek ji ciyê xwe leqıya, ne ji çıt  
derket. Lê ser çavê Kazım ji ser  
çavê nexweşeki ku sê sala dı  
nav ciya de mabe, zertır bû. Te-  
bati ji pê nediket. Bêdengi bı  
dengê Cemil bı nermiki xera  
bû.

Yaw ! Ev çı işe? Polis bıhata  
rakıra mlê ki, dıket serê meri-  
va, lê mlê Cemşit.

Dengek dın:

Erê law, ez hêji bawer nakım.

Cemil, Xwedê zane, ki iftırâ a-  
vê tiye serê. Lê, ev ne iftıraki pi-  
çûkeji. belki, kuştına taxa kani-  
ya şoli kırıbın stuyê wi.

Kenek bı dersxane ket, pê nç-  
şeş deng nav hev ket.

Ev işe hanê û Cemşit

Dibe, dibe haa!

Ma Cemşit bû Felitê Quto?

Ma polis ciyê belaseve hat rakır  
mlê wi. We qe nedit, çıqas polis  
hatın! Çawa sileha sıpartıbûnê!

Tam qelebalxek ketübû nava  
wan. Her seriki da dengek derdi-  
ket. Ew bêdengiya sê-çar deqe  
berê qet nemabû, meriv kırıbû  
sond bıxwara, nêlı vır bûye. Ma-  
moste xwe hazırkır wan bısekını  
ne, beriya wi dengek qalınd, ser  
hemi denga ket û gıšta seknand

Ez zanım çıye! Bavê Cemşit qa-  
çaxiyê dıke, belki mala wan da  
tışteki qefaltubın. Belki ji eroin!

Kazım fıkrı ku tam zemanê wi

ye, be yek car ki da gotına wi  
biri û got.

Dıbe, dıbe haa! Belki ewji ali  
bavê xwe kırıbe! Dengek bı  
hêrs derket, ev denga dengek ji  
dengê ketübû raberzina beriya  
dersê.

Law Kazo namussız(bê namus)  
te hêja.. ...

Qêrina mamoste, wek balteki bı  
hêz gotına wi yek derbeki da bı-  
ri. Bese! herkes here ciyê xwe!

Gotına mamoste usa sert bû ku,  
bêdengi yê dı nav çend saniya  
da afirand tev çün ciyê xwe rû-  
nıştın. Lê ciyê Cemşit vala ma.  
Tucar ewqası ciyê wi xwanê ne-  
dıkır. Wek nivê dersxanê ciyê wi  
be wisa vala xwanê dıkır.

Lê Cemşit, nezaretê da ciyek ti-  
ji kırıbû. Ciyek, dı quncıkta.  
Xwe kat kırıbû, kırıbû gılok li  
quncıkta. Wisa xwe quncıfandi-  
bû meriv dıgo qey yek li hember  
şûr bıındkırıye û lıser weşanê ye.  
Lê, kes tune bû. Ew bı serê xwe  
bû. Ne dıqırıya lê, kıza kıza wi  
hê dom dıkır. Gelek jê ra dıjwar  
dıhat. Tıştê dıjwartırın nızan bû  
sucê wi çıye. Ev lê xıstın, ev gir-  
tın ji bo çı bû? Dıgo helbet se-  
demeki wi heye. Lê ew sedem  
çıye? Dıfıkırı, dıfıkırı tışteki ji  
hev dernedıxıst. Belê, dızıya  
yekı nekırıbû, mêrê yeki nekuş-  
tıbû, xerabiki ne kırıbû, qaçaxi  
ne kırıbû. Herê bavê wi car car-  
na qaçaxi dıkır, lê ne qaçaxiyek  
mezın bû. Serê çend meha ye  
ku, bavê wi melesek qaçax ji ne  
ani bû malê. Bila, sedem qaçaxi  
bûna ji, tê da çı sucê wi heye?

Her carê tışteki dıfıkırı. paşê dı-  
got. viya ji nine. Qasê carek dıgo  
"iftıraye" 'ne iftırıyek bıçûk'  
belê, muheqeq iftırıye. Lê, her  
iftırayekıra ji sedemek heye. Se-  
dem ..sedem .. sedem çıye? Yek  
carki da hıpetiki, got. mın dit!  
Ez zanım çıye Belê, bıvê nevê  
ew e. Xeyni mala İse Mıstê yek  
nine. Ma hê beriya panzdeh ro-

jan li gund, nava wan û apani wi  
da şer derketübû. Ji xwe karê  
gundiya wı saye du kes li hevın  
navê malbatê bıgre heta tevek  
nêzikê wan dıdın. Qasek nema,  
got: "na lo ma yek nema, navên  
mın bıdın"

Hê dıfıkırı, komsêr û polisek de-  
ri vekırın, wi bırin bodromê.  
Komser destê xwe dı serê wi da  
û got.

Ki li viya xıstıye?

Hê bersiv nedabû komser dest  
bı nesiheta kır.  
Law ez zanım tu merıvek qenci,  
vıra ne ciyê te ye. Ji mın ra bêje  
û rabe here malê.

Cemşit yek carki de gotına wi  
biri bı çav keni got:

çı?

Komser dengê xwe bıınd kır:  
Law serhışkıya neke! Baş bı za-  
nıbe tu nebêji, termê te ancax  
derkeve.

Dengek bı tırs û niv giri,

Ez çı bêjum?

Komser icar qêriya. Cemşit hı-  
petiki.  
Law bı vê mırıtıya xwe tu yê  
mın bıxapını. Bêje ez cara paşın  
dıvê m.

Cemşit bı gırı: Wele ez nıza  
nım, wın çı dıxwazın.

Wi hê gotına xwe têkuz nekır,  
şırmaqa komser çıngını li mınê  
goyê wi ani. Pêra, pırtûkê dırê-  
ji çavê wi kır.

Bêje! dewar kurê dewara; te  
vê pırtûkê ji kuder ani?

Cemşit bı çavê gırbûyi li pırtûka  
bırê Cemil dınê hırı.

Lı ser dınvısı;

V.I.Lenin

'Gavek bı pêş, du gav bı paş ve'



# Di Xwendegêha Mamosteyî Ya Bilind De hevpeyvînek

## bi mamosteyê beşa kurdi FERHAD SHAKILY re

BERBANG: Wek tê zanin ev cara yekem e ku di xwendegêheke bilind da mamosteyên kurdi wê bîn amadekirin. Di dîtina te da giringiya wê yekê çî ye bo me kurdan?

F.SHAKELY: Vekirina beşa zimanê kurdi di xwendegêha berz ya mamosteyan li Stockholmê destpêka qonaxeka nû û girîng e, bi taybetî bo kurdên ku li dervey Kurdistanê dijîn. Belam divê li vir tiştekî ron bikim çunke ji aliyê dîrokî û mênjûyî ve girîng e û divê bê t zanîn. Ev ne dara yekem e ku xortên kurd, keç û kurên kurd, di xwendegêyeka berzda zimanê kurdi dixwênin û dibin mamosteyên zimanê kurdi. Li Kurdistanê Başûr yanî Kurdistanê Îraq, sala 1960 bo cara yekemîn, bişa ziman û bêjeya kurdi di zanistgeya Bexdayê da dest pê kir. Di nav wan salên ku şorişê Kurdistan xurt bû, bi taybetî ji sala 1970 heta sala 1974, her sal bi sedan kur û keçên kurd dihatin wergirtin û zimanê kurdi dixwendin û piraniyan wan jî dibûn mamoste. Herweha sala 1970 beşa zimanê kurdi li zanistgeya Silêmaniyê ji dest pê kir. Nuha rêjîma faşistîya Sed-

dam Huseyn herdû beşên zimanê kurdi pir teng kirîye û ji aliyê zanistiyê ve jî ne ewçend

pêşketî û berz in.

Ji sala 1960 û heta ev çend salên duwayî sedan xortên kurd zimanê kurdi li wan herdû beşan xwendin. Li dervey Kurdistanê jî zimanê kurdi li Lenîngrad têt xwendin. Herweha mirov dikare zimanê kurdi bi şeweyeka akademî li zanistgeyên Gottingen, Hamburg Michigan û Uppsala bixwîne.

Mirov dikare bêje li dervey Kurdistanê ev cara yekemîn e ku beşa zimanê kurdi ji bo amadekirina mamosteyên kurdi dest pê dike.

bi dîtina min mirov dikare giringiya wê beşê ji çend alîyan ve destnîşan bike.

a-) Ev cara yekem e ku kurdên Kurdistanê bakûr zimanê kurdi bi serbestî û di zanistgeyeka resmîda bixwênin. Ev jî, bêguman, hevîyeka mezin dida me.

b-) Di vê beşê da kurdên hemû parçeyên Kurdistanê bi hevra dixwînin, (Xwendekarên me îsal ji sê parçeyên Kurdistanê ve henin Turkiya, Sûrya û Îraq). Ev jî gaveka pir mezin e ji bo nehîştina sinûrên siyasî, komelayetî û zimanvanî.

c-) Xwendekarên wê beşê zanyarîyên xwe dê di praktikêda bi


kar bînin, piştî ku xwendinê tewaw dikin her li Swêdê dibin mamoste û zarokên kurd bi şeweyeka zanistî hînê zimanê kurdi dikin.

d-) Herweha divê em bizanin ku vekirina beşa kurdi ji aliyê welatê Swêdê ve pêşan dide ku doza gelê kurd pêşketîye û gel û welatên din nuha baştir mênas dikin û pêwistiyên me pê dizanin û dostayetiya me jî dikin.

BERBANG: Wek mamosteyê zimanê kurdi tu dikarî bi kurdi xwe bi xwendevanên me bidî nasîn?

F.SHAKELY: Min di zanistgeya Bexdayê, beşa zimanê kurdi xwendîye û dû sal jî rojnamevan bûm. Sala 1974-75, ez pêşmerge bûm. Sala 1978 hatim Swêdê û min sê salan wek mamosteyê zimanê kurdi kar kir.

Sala par li zanistgeya Uppsala min dest bi doktora kir. Ez doktoraya xwe li ser bêjeya kurdi dikim. Min heta nuha çend perçû çap û belav kirîye. 1-Pirojey Kûdetayekî Nihênî(helbest)-1973 2-Rûbare tişkêk le hetawî sû rewe(helbest)-1977 3-Hewraz(helbest)-1980, 4-Kurdish Nationalism in Mem û Zin of Ehmedê Xani(bi Înglîzî)-1983. Herweha sala par, nivîskarê



Swêdî Lars Backstrom, kak Bextyar û ez, me 20(bîst)helbestên şairê Kurdistan yê mezin Goran wergêra ser zimanê Swêdî û hevîdar im sala 1985 çap bibe.

BERBANG: Xwendina vir çend salan dajo û çend xwendevanên kurd hene?

F.SHAKELY: Xwendina zimanê kurdi, li vir dû sal e lê xwendekar ne tenê zimanê kurdi dixwênin belku çend dersên di jî dixwênin. Îsal 9 xwendekarên me hene, lê hevîdarim ku salên dahatû xwendkar pirtir bin.

BERBANG: Wek mamoste hê vî û gûmana te çî ye ji wê xwendegêhê û xwendevanên kurd?

F. SHAKELY: Berî her tiştî, wek kurdek, ez gelek dilxoş û bextyar im gava dibînim zimanê kurdi jî wekû gelek zimanên di xwendegêyeka berzda têt xwendin. Ez baş dizanim, neyarên gelê kurd û dagirkerên Kurdistanê çend ji pêşveçûn û geşekirin û pêşxistina kultur û zimanê kurdi ditirsîn û çend bêzar dibin.

Xwendevanên me, li vir zimanê kurdi bi şeweyeka zanistî dixwênin. Îro eger em kovar û roj-

nameyên kurdi temaşa bikin û serinc bidin. dibînin ku piraniya xelkên têda dinivîsin, kurdi çewt dinivîsin Bi vî awayî çewtî belav dibe û diçe nav xelk û xwendevanan. Çewtî ji nezaniyê têt. Belam, bêguman, divê çewtî çû çewtnivîsîn bê t rawestandin bê t ragirtin û bê t rast kirin. Aşkîra ye ku ev ne karê yek roj û dû roj e. Ne karê yek sal û dû sal e jî. Ev karê serdemekê dîr û dirêj e Lê gava yekemîn divê rast be, divê zanistî be.

Erk û karê beşa me ev e ku xwendekarên bixê ser rîya rast û zanistî. Eger em bikaribin di nav 4-5 salanda 40-50 mamosteyên zimanê kurdi amade bikin û pê bigihînin, ku hemûyan zimanê kurdi bi şeweyeka zanistî xwendebin û şarezayê edebîyat û dîrok û komelgeyê Kurdistanê bin ew dê di demeka kurtda kar bikin ser şagird û xwendekar û dost û hevalên xwe ji û rola wan di pêşxistina kulturê kurdi da, dê gelek mezin û hêja be.

Bi rastî beşa kurdi li 'xwendegêya mamosteyan li Stockholmê' beşeka pêşeng e, beşeka pêşrew e. Çî mamosta û çî xwendekar, em hemû bi dilekî germ bi dilekî tijî bawer û dilsojî karê xwe encam didin û em hevîdarin ku beşa me sal bi sal pêş bikeve.

# JÎ NIVÎSÊN MÎNORSKÎ: OLPERESTÎ DI KURDISTANÊ DE-5

## *Egerawîn*

Kurd bi pirîti, misilmanê sunnî ne. Û ev ji kurkan re bikêrhatîye ko karibûn kurd bivi rengî ji Farisan, dûr bikin. Û bi xweve girêbidin.

Di sala 1905-1912 de bivîrengî, kurd kirin hevalbendê xwe û zora Îranîyan birin. Serdarê Turk Tahirpaşa eşkere digot: Kurd, hemî, ji dewleta Osmanî tene jimartin. Lê birastî û eger em dûri awira sinnîti herin, kurd li ser ol û rêçeke di ne, ko rêçika Şafîî, ye. Û Turk li ser rêçika Henefî ne. Û gelek diriste, ko bivî rengî rojeke ji hev dûr bikevin. (Mînoruskî ola îslamê nasnakî, ji lewra wilo dibêji.)

Herwekû hin tiştên dijî, hene ko divî warî de xurt lîztine, evjî eve ko hin serdar û Derebegên Kurdistanê, dibêjin: em ji zariwên peyrewên: Ebbasî Emewî ne. Û hinjî dibêjin, ko ola Ebbasîya kevnare, hêj li (Cizîra Bota) ye. Û ji bo wilo soza padîşahîya turkan hatiye parastin. Ev tişteke ko devjeni jêre navê. Li ser nabî.

Heta di olikî Îslamê de jî, lê kurd dikarin bê qestenyêjî di vî rîya îslamê ve herin.

Li Kurdistanî Îran hindama Deştetal nêzîkî Bane û hin êl û eşîrên di jî, li hêla Zihaw.

Û hin eşîrên Elewî hene, ko xwe bi Îran ve girêdidin û ez li wan rasthatime û min hinek ji wan dîne ko têkelî hindî bûne

xwe ji bîr kirine.

Gereke em bidin zanîn ko şêxên kurd xwe bi ola Îslamê nagirin û tevli ko Sunnî ne jî lê gelek dûri hev ketine.

Şêxên Şemdînan, Şehrezûr ketine rêçika Neqşebendî û gelek xwe bi stûra îslamê digrin û bawerîya îslamê diparêzin û bawerîyên dikin ko ew malbat gelek bilind û pak û paçijî û gorna bav û kalên wan gelek pak û pîrozî û bawerdikin ko dikarin gelek karên kesnedî bikin..

Ev tevgera sofîti li nik me eşkereye di tarîxê de baş tê bîrmin, ko rojekê Şeyx Ebdîlqadirê Nehrî dihate nik min û serdarekî turkî tevli siwarê xwe li ser sinor rawestîya bûn û çawa Şêx dîtin berpê çûn û serê xwe jê re danîn û bi saw û tirs destê wî maçkirin.

Lê Şêxên Şehrezûr ne tenê kurd, belkî hemî kes rûmeta wan digrin heta ji Asya navîn tene dîtina wan û xwe bi wan pîrozî dikin.

Son, pesnê wê lêrastîna xwe li wan misilmanên biyarî dikî ko çawa ji Mekê hatin û çûne dîtina şêxê biyare.

Lê ew şêxên ko gelek xebatî dikin û gelek ditirsîn bi pirîti li hindama Sablax bûne û min çend caran yek ji wan dîye, ev şêxê ko min dîye mirovekî derwêş û sofî bû dev li ken, xwedî rûmet bû, pêzanekî mezin bû, herwekû ristevanekî pak jî bû.

Dostê minê kevnare ko tim bi min re digeriya D.D. Bilyaîf di sala 1914 de li vî şêxî rast hati-

ye derwêşan li Erbana dixistin û di ber ve digotin paşê li ser dengê defê sivik digotin heta ko gîhane rewşeke wilo kesnedî ko xwe winda kirin, xwe hiltavêtin, serê xwe li dîwaran dixistin, poş didane hev, bi laşê xwe ve digeriyan û weke çerxê dizîzîkî, porgijgijî, sergever wan rebenên kurd, hin tevgerên hestîya dikirin û hevdi digirtin...

Bê gomane ko ev rengdîntî mewanên şêx gelek têşandin û ji Ewrûpîyan re tişteki kesnadi bû, ji lewra yekî ji wan dilê xwe girt û gelek xeyîdî û ji şêx hêvî kir, ko idî hew wilo bikin û çawa şêx ji wan re bigotinekê got hemî bi hev re, dicide sar bûn û rawestan.

Bivî rengî em dibînin ko Sofîti tişteki nûjene. ne ji îslamê ye, tevli vîqasî jî Olperestî li nav kurdan didî zanîn ko rêçikên wan neweke hevin û ji newekhe vîya rêçikan ev tişt derketîye.

Du olên newekhev, kesnedî li nav kurd hene.

1- Yezîdî ko li ser oleke kevnare diçin û di vî paştyê de gelek dixwestin ko hin nivîst û nivîsarên wan ola yezîdî bêne dîtin.

Berî sed salî me dizanîbû ko nivîşteke wan di ola wan de hatîye dêkirin lê me nizanîbû çî tede heye. Lê di sala 1895 de yekî Îngilîzî O.Parî, du nivîstên yezîdîyan biçûk belavkirin. Celwe û Mishefa Reş. Lê Enistas Marî herdu nivîst bi kurdî erebî di çaxekî de û bi hev re belavkirin.

Koka wan di derekê de di nav



sindoqekê de vaşartî bûn, ko ew dêr dikevi çiyayê Şengalê, lê Enîstas Marî bi hosteyî dergeva nê n ber dêrê kirin, dostên xwe û nêzîkî du salan ew herdû nivîşt guhaztin deftera xwe lê gelek bidizî û dijwarî ev karê ha dikir û diguhaztin ser kaxtekê tenik datanî ser riwê rûpel û dînivîsî û bi vî rengî gelek dijwarî dîtî ji ber ko nivîsandina kurdî bi hin tîpên kurdîya kevnare bû. Lê Enîstas Marî ne tenê dinivîsî, belkî ji hevdi ji didane alf û rimûzên wan vedipişafîn. Lê dawî M.Pîtir bi awakî zanistî ev herdû nivîşt li Vîyêna di sala 1913 de belavkirin.

Tiştê gelek dijwar eve ko pêzan û hozanên Ewrûpa ji vî karê Rossî, karek nekirin û bêgoman ko gelek hêja û karmend bû.

Konsilosê Rûsî Kartizof li ser yazîdiya dabaşek di sala 1884 de nivîseke ko tede dibêjî: Min hin perçe ji nivîšta Gelwe dîtine û paşê tercume kirine ko goman di wan de nîne lê Enîstas Marî tenê ev rûmet ji xwe re sitandîyeko ev xwepêgirtîya han mezin çapkirîye û belavkirîye û perçe paşî li nik Kartizof weke vewejandîna nivîšta reş (Mishefa Reş).

Misilman ji Yezîdîyan re dibêjin Şeytanperes lê di fro de û piştî ko ev tiştên nûjen hatine dîtî ev dijûn bûye tiştêkî hiç û çîrokekê ji hev nadî alî (Vena-wejêrî).

Bi rastî Yezîdî bi xwe jî dibêjin ko Şeytan xwedayê meye (Melekê Tawis e) yan jî Bavê Tawis e, lê herdû nav jî pesnekî xwedê ne. Ola yezîdîyan xwe jêdereki peyda bûne û Rûçik-Sikil 6-7 firîştin: Tawis, Cibril, Îzraîl, Îsraîl, Nûraîl... Ji yek jêderîne û vi xwe hatine bebûnê û çêbûne weke çêkirina ronahî ji ronahî. Agir ji agire û van her heftan ev çîhana diyarî çav çêkirine ji bil Agir ko xwedê ew

çêkirîye.

Şer di bawerîya Yezîdiya de ne ji hêzê Xo tebie te, belam xwe dê wilo xwestîye û piştî ko li-hevbên wê dijminahî rabî.

Lê xwe bixwe ji canê Yezdanê pak hatiye veqetandin û bavê Tawis tenê cihê pîrozîye ko mirov jê re serê xwe nixûm bikî. Êzêdî bawer dikin ko can ji yekî dîçî yekî dî, ji laşekî dîçî laşekî dî û ji agirê re nimêj dikin yan ji Ronakê re nimêj dikin û li nik wan xes. Baqla Masî xwarina van nêdiriste û kincên şîn wernagerin.

Hin peyayên olnas di nav wan de hene ko civatan digere nin û olê nîşanî wan dikin. Dêrên wan jî hene. Dêrê wan ya herî mezin berê kenîsake fileha bû û di Geliyê Laleş de bû, tenê Şêx Edî tede veşartin û bû pîrozgeha wan. Vî mirovî ola Yezîdî parasîye û wî nivîšta Gelwe-çêkirîye Lê misilman vî mirovê tarîxî ko di sedê 12 (diwazdehê) zayîne de bû ji mirovên mezinên îslamê dihejêrin û nabêjin, ko liser oleke dîye. Lê tevî vîqasî jî misimana di sala 1415 de gorna wî hilweşandine tenê careke di peyrepên wî ava kirine.

(Misilman dibêjin: Edî kurê Misafir kurê malbata mala Emewî ye. Ji gundê Beytilfar hatine nav Hekarîyên kurd, rajorê Mûsil. Navê ola wî Edewî ye, ko bi xwe yek ji rêçikên soffiyên Kurdistanê ye. Berî hingî dinav Erebana de jî hebû tenê nikarin bigênin ser yekî emewî navdar, tenê navên du sê bavên wî didin xuyakirin. Lê ne tenê Edî dibin ser nijadê Ereb, belkî jî hemî malmezin û rûmetmendên Kurdistanê xwe bi derew dighênin ser gêlê Erebên ko bo ola Îslamê hatine pîrozkirin, ji bo ko karibin malê miletê kurd bidizin, bixun û mezinahiya xwe dinav me yê nezan de rûmetmend û pîroz bikin. (Cigerxwîn).

Mînorûskî pêde diçî û dibêjî di 23 ê Eylûlê de Ezîdî cejneke xwe li dar dixin, heft rojan şahî û dîlanê dikin, Labard yê Ewrûpî tenê karibû xwe bihgînî navê cejnê ko pesnê şahîya bi şev û nimêja dibin çiraxa de bi denge nayê re bikî.

Gereke em bidin zanîn ko melek Tawis û Temûz xwedayê Babilî nêzîkî hevin û dinav wan de girêbendek heye ko bi xwe xwedayê roj û germa havînê ye û Yezîdî Melek Tawis di rengê Tawis de çê dikin û di nav ola Yezîdîyan de gelek pîroz û bi rûmete. Ji ber ko Temûz Tawis nêzîkî hevin, hin pêzan bawer dikin ko girêbendek di navbera ola Ezîdî û olên kevnareyên navbera herdû avan Mezopotamya de gelek xurte. Eşkeraye ko di sedê yazdehem de li Heran ji Zîn xwedayê rojê re gerden xwar dibûn û jê re nimêj dikirin ko li nik Ezîdîyan navê wî Şêx sîn ne.

(Min navê Şêx Şems bîhîstîye lê navê Şêx Sîn nebîhîstîye, ca nizanîm, ka Mînorûskî ev ji ku anîye? )

(Çawa dibî bere bibî, lê ola ez-dî ji gelek olên kevnare gîhaye hev û di nav xwe de wan kevnare-olan digrî, ko destê me de tiştêkî mezin heye, awira wan di çêkirina çîhanê deye herwekû zêde dijminayîya ola îslamê dikin û li nik wan misilmanî gawirîye. Herwekû heta di nav nivîna jinka misilman de jî ranazên û nahêlin ji tasa wan av vexun. Mînorûskî dibêje. Jimara Ezîdiya sed hezar mirov, ko li Turkiya ne, li nav çiyayê Şengalê û Şêxan, Mûsil, Hekarîya, Xerza Milan, Baravan, Hevêrkan belav bûne. (Cigerxwîn)

Li Rûsya Qafqasya 25 hezar mirov hene jimara 1910, (lê di îro de em baş nizanîn ka jimara wan çend sed hezar mirovin. (Cigerxwîn.)

## 2- OLA DIWEM ELÎLAHÎ YE

Ev oleke kurdî sadeye û nehatîye naskirin, ji ber ko kê m hene liser mijul bûne û lêkolane û ew jî di serve çûne û di serve lê nerîne

Dibêjin. Elî kurê Ebî Talib, jî xwe re kirine xwedê ko, peyre-wê çarem piştî Mihemed' -Peyxembere. Lê bi rastî li nik xwe dîyên vê olê çêkirina cihan weke awira misilmana ye û li nik wan Xwedê xwe heft caran eşkera dikî, û di cihanê de xwe didî xuyakirin. Lê di Elî de xwe carekê eşkera kirîye û her xwedêkî çar firîşte-Melaiket pêre hene ko ew ji weke xwedê ne. Mihemed Peyxember yek ji wan her çara bû ko bi Elî re daketîye. Lê sirra veşartî di çaxê Elî de derneketîye û piştî wî hatiye xuyakirin. Di çaxê Babexoşî û Sûltan Îshaq de Sîr hatiye xuyakirin û eşkera bûye. Lê tiştê pir hêjay gotine, eve ko dibêjin: xwedê di destê mezinê Firiştê deye û bi wîre hatiye xwerê.

Elî ilahî bawer dikin, ko can te nasux dikî û mirin weke Betê ye xwe noq dikî bin avê û di cîkî di re derdikevî û biratiye-destbiratiyê dirist didêrin, yanî dikarî yekî ne ji dê û bavê xwe jî ji xwe re bikî bira û nan û goşt belav dikin. Ji ber wilo hin dibêjin: Ev tişt ji fileha girtine ko dîr kevnare de nan û goşt belav dikirin. Lê bawer bikim ko ev gotin ne raste. Ji ber ko bicarek dîrî fileha ne û bi hîç tiştêkî nêzikayî li filetiyê nakî. Di navbera Elî ilahî misilmana de seraser dijminî heye. Qizilbaş ko liser vê rêçikê ne ko li Dêrsim rûdinê n, gerdana xwe ji turkan re xwar nakin û Elî ilahî li Turkiya hemî wilo bawer dikin, wilo dibêjin. Ji wan re dibêjin Qizilbaş Sersor yan tiştêkî sor li serê xwe girêdidin û feris ko wilo ji wan re dibêjin, tinazê xwe bi wan dikin.

Herwekû mirov bawer dikî, ko ev rêçik ji Îran hatibî, li Asya Biçûk Qizilbaşên Turkiya bawer dikin, ko Xwedê daketîye ser riwê zeviyê ko karekî bikî û Elîyê Şervan şûre xwe daye Rûsa û nişana kesk daye İngilîza û ev herdû dewlet wê Turkiya winda bikin.

Pêzan û gerokê Rûsi di sala 1913 de li Sêwasê ji hina ji Qizilbaşan bihistîye ko Elî wê di sala 1930 de xwe li ser zemînê bidî xuyakirin û em xwe pêk tînin ko herin pêrgî xwedê. Elî û şêrê mezin di sala 1330 koçî de çêbûye. Hin nivîstên xwedîyê vê rêçikê bi kurdî-Goranî çêbûne û hatine nivîsandin. Ez ê pêşî me ko cara yekem min destnivîsa wan xîstîye destê xwe û min yek ji wan destnivîsan ko navê wê Serencem e çap kirîye. Di sala 1914 de ez çûme nav wan Qiblegeha wan ya mezin gundê Pîrdîwar ko dikevi Hawraman û dinav hin çiya û latên bilind û dijwar de hatiye veşartin û ev hindam ji hindemên pir xweş tê jimartin.

Qiblegeha dikevi rojavayê Zihav ko gornistana Babayadîgar û ev ji ya dî mezintirê û bêtir rûmeta wê digrin. Beri min du gerokên Rûsî çûne vê hindamê ko yekî Baron Bûdî bû û navê e dî Serdar. Çikof bû. Lê ez gihamê hemî veşartîyên wan û di virde ez deyndarê mezinên vê rêçikê me ko bi camêrî alikarîya min dikirin û bawerîya xwe dane ser min û tiştêkî ji mir veşartin ji ber bostekê ji vê qadê dibirhatîyên min hene ji men re digotin: yek ji derwêşan ko xwe windakiribû di vê hindamê tera kire binê newalê û perçe perçe bû lê dikir gazî û digot: vaye hatim nik te ey babayadîgar min li nik xwe ragire

Rêberên me gelek dilovan û bi tûre û nerm bûn mûmek û qedehê dane min ko navê wê qedehê Keslan bû ji bo ko ez wan bînim bira xwe

Ev gera min gelek xoş bû û ta ko saxim jibînakim û dixwazim perçak ji nivîsandina xwe ya rojane divirde binivîsim.

21 Nîsan 1913 taveheyv bû, ez man paqij bû, hin kevirên kelehê kevnare belav bibûn, keleh wêran kumişî, li serê çiyakî hin senewbarên hevgerî li hawîr hîn çiyayên çil û sipî, çawa ko Bûdî gotîye: Weke Ayîneke pir xweşik, weke hêka Derrace lê bilind û bi saw xwe di hêlineke kesk de vaşartîye çîrîk çîrîka çûk û çivîkan ko ji binê wê derdiket, weke dengê derwêşan ho ho û dengê zengila mehîna min dinaliya. Leşkerê qazakê siwarî sîtranek kobanî digotin. Xewneke mezin bû diwazde salan ez li hêvîya wêbûm. Lê dawî lihev-rasthatîne ez avê tim vê hinda me kesnedî hergav di rabûrî de diramiyam û hewesa xwe tavê te rewşa kevnare divê goristana beroj de ko ji hev wergirtine û karê vê gornistanê li peyhev dikin çavnerîya kirasekî mermerî dikin dibin siya van mirovên ko bav û kalên wan ew dîne û diris-te ko di pêşber mirovên veşartîyên xwe û xwedîyên xwe û xwedîyê tilismê babayadîgar bi xwe bin.

(Bibûrin di vir de hinek girik hatiye ji ber ko nizanim, ya min baş nasnekirîye, yan jî ji Rûsî xweş û paqij nehatîye tercûmekirin. Xwendevanên kurd win bala xwe didinê ko çawa ne kurdan ji bo me, yan ji bo zanî tenê çiqas xwe bi hin tiştên ne-hêjayî ve eşandine û kuncêk ji Kurdistanê nehiştine ko lê negerîyane. Ma ne gereke ko em supasên xwe ji wan camêran re pêşkeş bikin û hinekî biser xwe de bipûjinin û ber xwe kevin ko heta niha çira me ji millet û welat û rewşa jîndariya xwe re nekirîye. Mexabin ko niha wilo dibêjim, ez riwê xwe diqermîçînim, şerm û fihêt dikim û jiber milletê xwe ve supasên giranî ha ji wan re pêşkeş dikim.)

(Gîrxwîn)

## XEBATÊN "PROJA KURD"

Dî 26'ê Ilonê de Proja Kurd li Tensta Rinkeby civinek bi temsildarên Sosyal Demokrat yê Belediyê re (ji bo navçeyi ya xebata Sosyalî) çê kir, li dora 40 kurd beşdar bûn.

Bineciyên Navça, Tensta û Rinkeby du pirsên xwe yê n taybeti anin ziman:

1-) Gelek kurd ji welatê, xwe bi pirani ji zordestiya siyasi, derket hat Swêd. Gelek ji wan nikarin vegerin welatê xwe ku dost û mirovên xwe bînin. Li vir izolekiri ne. Divê li vê navçeyê lokaleke ji bo kurdan peyda bibe û kurdên vî navçeyê lê wêderê karibin bicivin, hevdû bibinin, bihna xwe bi hev derxin. Bi taybeti Komelê xortan ku gelek endamê wan li vê navçeyê heye bê lokal e.

2-) Dî vê navçeyê de ji bona zarokên kurd, giringiya cigêha zarokan (daghem) hate ziman û ev pêşniyar ji alî Sosyal Demokratên ve li cih hate ditin.

PROJEYA KURDÎ LI TENSTA Û RINKEBY DÎ 24.09.1984, DÊ BO JINÊN KURD QURSA XWEŞI, NEXWEŞINÊN JIN Û ZAROKAN DE BISEWIRINE. BO AGAHDARIYA ZÊDE STENDINÊ ZÛTIR TELEFONÎ PROJEYA KURDÎ (KURDISKA PROJEKT) BIKIN.

TEL: 08/761 66 46 Dr.GELAWÊJ  
WEXTÊ TEL: (13 00 16.50) HER ROJ JI BİLÎ ROJA ÇARŞEMÊ

Projeya Kurdî dî wexteki nêzik da wê qursa hinkirina dagirtina blanketa bisewirine bo kurdên li Tensta û Rinkeby. Herweki Blanketi försäkringskassa, Bostadsförmedlingen, Deklaration, û hwd.

Adres: Kurdiska Projektet  
Åvingegränd 23  
163 62 Spånga

## BROŞURA " RAPORÊN SEMINERÊ , KURD LI SWÊD" DERKET

Weke tê zanin dî 4-6 Avrîl 1984 an de (3 roj) li Sigtuna yê (bajarek Swêd nêzi Stockholmê) seminerek li ser kurdan pêk hatibû. Seminer ji aliyê Sazgeha Biyanîyan li Swêd (SIV) bi tevkariya Federasyonê ve hatibû amade kirin. Gelek pirsên gelên kurd, ji siyaset ta ziman û çand dî vê seminerê de hate ziman.

Dî Tebaxa 1984'an de raporên seminerê ji alî SIV ve weke broşurek bi Swêdi hat weşandin û sazgehê Swêdiyan re hat şandin.

Broşur 63 rupele û ji ' Statens Invandrarverk, Box 61 13, 600 06 NORRKÖPING' bêbuha dikare bê xwestin.

Sigtuna 4-6 aprîl 1984

Rapport från seminariet

KURDER  
I SVERIGE

Statens invandrarverk 

# Hin Bûyerên Ziman

## Tori

Li gora lêkolenekê, heta îroj li ser rûwê gerdûn "dinya" 2796 ziman hatine axaftin. Lê ew ziman îroj hemû naîn. Hin ji wan zimana mirine. Bikar nayên Yanî ji aliyê ti gelna nayên axaftin. Weke zimanê Latîni, zimanê Misrê î kevî, zimanê Lidya, Firîga û Hîtîta. Em heyîna zimanê mirî ençe li ser kevî nara, di nav rûpelên pirtûkan de dibînin. Dîsa li gora wê lêkolanê, ji wan zimana 118 ziman bûne zimanê dewleta. Kurdî jî di nav wan zimana de ye.

Bêşik weke ko di her zimani de heyî, wê bûyerên ziman di Kurdi de jî hebin. Ev bûyer xwerûyên "özellik" zimana ne. Hin ji wan bûyera jî aliyê qeflîna 'grup' civakî, hin ji wan jî, di ziman bixwe diafirin. Ji aliyê bûyerên dengê kurdî çar sedem hene ko em li ser wana birawestin.

1. Ketina denga di zimanê axaftinê de.
2. Ketina endamekî wûşa.
3. Xweguhartina denga.
4. Kurtbûyna wûşa.

### 1. KETINA DENGA.

Em li kîjan zimanê ko îroj tê axaftinê meyzînin, emê bibînin ko ew ziman weke tê axaftin, nayê nivîsandin. Ev yek şanî me didî ko zimanê axaftin û nivîsandinê di cihne de jî hev tîn veqetandin. Di zimanê axaftinê de, bi piranî, ji ser dengna tîn qevaztin, nayên gotin. Ev bûyer ne ji ziman bixwe diafirî. Ji aliyê qeflîna civakî tîn afirandin û li di her demî û di her cihî de tîn kirin û ne li her gora rîstina dibin. Pêwanê di derheqê wê bûyerê de ti recon nayên danîn. Ençe, weke ko li jêr berxî, girêdayî sebepna ye. Lê bere ev yek qet neyê jîbîrînin, ketina denga ti carî di zimanê nivîsandina kurdî de nabî. Bitenê di zimanê axaftinê de ye.

Ketina denga di zimanê axaftinê de:

1. Ketina denga di lêkerên fermanî de, Nîşe: 1-Bîşkêne, bavêje, bibhure, bîmrêne, binvîse, birjêne, bişyêne, balîse, bidyê, bistêne, mavêje, meşkêne, meşyêne,
- 2-bîşikêne, biavêje, bibuhure, bîmirêne, binivîse, birijêne, bişiyêne, bialîse, bidiyê, bisitêne, meavêje, meşikêne, mediyê, meşiyêne.

Têgihêştin:

Wûşeyên rîstanyekemîn di textlîte lêkerên fermanî de ne.

Weke ko di rîsta duyemîn de binê wana bi xîşkdanê hatî nîşankirin, dengik ji wan wûşeyên rîsta yekemîn ketîye.

Weke ko tê zanîn lêkerên fermanî gelek bikar tîn û bilez tîn gotin. Di vê gelek bikaranîn û gotina bilez de ew nehatine gotin. Pêwanê ew deng ketine.

Sebeba din î ketina denga cîhguhertina derbdâyîna "vurgu" wûşe ye.

Nîşe bişikêne, biavêje, bibihure, bîmirêne, binivîse.

Weke ko binê wana bi xîşkdanê hatî nîşankirin, di lêkerên fermanî de derbdâyîna wûşa, li

ser kîta wûşe î duyemên deye. Gelek bikaranîn û bilez gotina lêkerên fermanî de derbdâyîna cihê xwe guhertiye.

Nîşe: bişkêne, bavêje, bibhure, bîmrêne, binvîse, birjêne.

Bi ketina tîpa kîta yekemîn î "î", tîpa kîta duyemîn î yekemîn, bi kîta yekemîn ve yekker bûye û pêra hatîye gotin. Pêwanê derbdâyîna jî ser kîta duyemîn, hetîye ser kîta yekemîn û ev cîhguhertina derbdâyîne bûye sebeba ketina dengê wûşe.

2 Ketina denga ji wûşeyên kurtbûyî î pîrsan de:

Nîşe:

1-çîbkim, çîbkî, çîdkî, çîdkin, çîtera, çîlmin çîlte.

2-çî bikim, çî bikî, çî dikî, çî dikin çî ji te ra, çî li min, çî li te.

Têgihêştin:

Wûşeyên rîsta yekemîn kurtbûyîne gotinên pîrsa ne.

Weke ko di rîsta duyemîn de binê wana bi xîşkdanê hatî nîşankirin, dengik ji wûşeyên kurtbûyî î rîsta yekemîn ketine.

Weke ko tê zanîn wûşeyên pîrsa gelek bikar tîn û bilez tîn gotin. Di vê gelek bikar hatin û bilez gotinê de gotinên pîrsa kurt dibin û di vê kurtbûyîne de jî dengik ji wana ketine.

Sebeba din î ketina denga ji wûşeyên pîrsa, cîhguhertina derbdâyîna wûşe ye.

Nîşe: çî bikim, çî dikin çî ji te ra, çî li min.

Weke ko binê wana bi xîşkdanê hatî nîşankirin, derbdâyîne gotinên pîrsa li ser kîta yekemîn î wûşa duyemîn de ye. Gelek bikar hatin û bilez gotinên pîrsa de derbdâyîna cihê xwe guhertiye.



Nîşe: çibkim çidkir, çijitera, çilmin, çilte.

. Bi ketina tîpa kîta yekemîn î wûşa duyamîn î "i", tîpa kîta wûşeya duyemîn î yekemîn, bi kîta yekemîn ve yekker bûye û pêra hatîye gotin. Ev yekkerbûn bûye sebaba kurtbûyîna gotinê pîrsa û ketina dengê wûşa pîrsa.

## 2. KETINA ENDAMEKÎ WÛŞA

1. Ketina endamê wûşa di lêkerên fermanî de:

Nîşe:

1-bazde, bake, bêje, derke, pêşxe, ziwake, dirêjke, xweşikke, ziravke, kê de, tê ke, lê ke, jê ke, pê de, levde, tê xe, lê xe, vê xe, tevde, rê ke, jirê ke, jiberke, jihevke, lihevke.

2-bazbide, babike, bibêje, derbike, paşbixe, ziwabike, dirêjbike, xweşikbike, ziravbike, lêbide, tê bike, jê bike, pê bide, levbide, tê bixe, vê bixe, tevbide, rêbike, jirê bike, jiberbike, jihevbike, lihevbike

Têgiheştin

. Wûşeyên rista yekemîn di texlîtê lêkerên fermanî î kurtbûyî de ne.

. Weke ko di rista duyemîn de binê wana bi xîşkdanê hatî nîşankirin, endamek ji wan wûşeyên rista yekemîn ketîye. Ew endam guherkera fermanî î "bi" ye.

. Weke ko tê zanîn lêkerên fermanî gelek bikar tên û bilez tên gotin. pêwanê ew endam ketine.

. Sebaba din î ketina endamê wûşê cihguhertina derbdâyîna wûşê ye.

Nîşe: bazbide, ziravbike, ziwabike, derbike, lê bixe, pê bide.

. Bi ketina endama wûşê î "bi", kîta talî bi kîta pêş xwe ve yekker bûye Lewma lêkera fermanî kurt bûye û endamek jê ketîye.

. Endama wûşê î "bi" guherkera

fermanî ye. Di pêş û carna di nav wûşê de cîh digrî. Bi ketina guherkera fermanî î "bi" kîta lêkerê ko derbdâyîna li ser sipartina fermanî dikî.

NEXWE :

. Xwîyaye ko dengin û endamin ji wûşeyê kurdî dikevin. Ev ketin, weke ko me li jor berxist, ti carî na gihejî zimanê nivîsandinê. Di zimanê axaftinê de dimînî. Ew wûşeyê ko deng an endamik jê ketî, ti carî di nivîsandinê de bikar nayên.

## XWEGUHERTINA DENGA

1- Guhertina denga bi veqetana nava:

a- Xweguhertina dengê "ê" bi dengê "î"

Nîşe:

1- dê, rê, pê, xwarzê derpê.

2 diya hevaleyê, riya gund piyê te, xwarzîyê min derpiyê wî.

Têgiheştin.

. Weke ko binê wana bi xîşkdanê hatî nîşankirin, navên rista yekemîn bi tîpa "ê" qedîyane.

. Navên rista yekemîn, di rista di rista duyemîn de veqetîyana ser nav an cihnavne din. Dê, ji dêya bûye diya hevaleyê, rê, ji rêya, bûye riya gund, pê, ji pêya, bûye piyê te û yê din.

. Di vê veqetana nava ser nav an cihnava weke ko di rista duyemîn de binê wana bi xîşkdanê hatî nîşankirin, dengê nava î "ê" xwe guhertîye, vergerîya ye dengê "î".

. Navê veqetandî ser navekî din an cihnavekî tîpa "a" û tîpa "ê" sitandin e.

Nîşe: diya hevaleyê, piyê te.

. Xwîya ye ko nav di veqetanê de tîpa "a" an "ê" disitênin. Ev tîp, tîpê veqetandekê ne. Ji alîkî din ve nav di veqetandinê de bi sitandina tîpa "a" zayenda

xwe yî mê, bi sitandina tîpa 'ê' zayenda xwe yî nêr nîşan dikin.

b- Xweguhertina dengê "î" bi dengê "i" :

Nîşe:

1-zevî rêvî, devî, masî, dasî.

2 zeviyê gund, rêviyê zozan, deviyê çiyê, masiyê derya, dasiyê ceh.

Têgiheştin:

. Weke ko bine wana bi xîşkdanê hatî nîşankirin, navên rista yekemîn bi tîpa "î" qedîyane.

. Navên rista yekemîn, di rista duyemîn de veqetîyana ser navne din. Zevî, ji zeviya bêye ziviyê gund rêvî, ji rêviya, bûye rêviyê zozan û yê din.

. Di vê veqetana nava ser navne din, wêke ko di rista duyemîn de binê wana bi xîşkdanê hatî nîşankirin tîpa xwe î "î" guhertin e, vergerîyana tîpa "i".

. Navê veqetandî ser navkî din tîpa 'ê' sitandin e.

Nîşe zeviyê gund, rêviyê zozan deviyê çiyê.

. Xwîya ye ko nav di veqetandinê de tîpa "ê" disitênin. Ev tîp tîpa veqetandekê ye. Ji alîkî din ve nav di veqetanê de bi sitandina tîpa "ê" zayenda xwe yî nêr nîşan dikin.

2-Xweguhertina denga bi veqetandina nava:

a- Xweguhertina dengê "a" bi dengê "ê" :

Nîşe:

1-sewal, welat, dewar, bajar, kalan

2 emê sewel, bêhna welêt, kozika dewêr, tara bajêr, zivê kalên.

Têgiheştin:

. Weke ko binê wana bi xîşkdanê hatî nîşankirin, navên rista yekemîn, di kîta xwe yî duyemîn de tîpa "a" sitandin e.

. Navên rista yekemîn, di rista duyemîn de navin veqetandin e. sewal em, welat bêhn, dewar kozik, bajar tar, kalan navê zivê veqetandîye.



Di vê veçetandinê de, weke ko di rista duyemîn debînê wana bi xîşkdanê hatî nîşankirin, dengê nava î di kîta duyemîn de î 'a' xwe guhertîye, vergerîyaye dengê 'ê'.

Navê veçetandî tîpa 'ê' û "a" sitandin e.

Nîşe: emê sewêl, bêhna welêt.

Xwîya ye ko navê veçetandî tîpa 'a' û 'ê' sitandin e. Ev tîp tîpê veçetandekê ne. Ji alîkî din ve navê veçetandî bi sitandina tîpa 'a' zayenda xwe yî mê, bi sitandina tîpa "ê" zayenda xwe yî nêr nîşan dîkin.

b-Xweguhertina dengê 'a' bi dengê "ê" li her deverî wûşe:

Nîşe:

1-aş, ba, xanî, zilam, agir, ban.

2 coka êş, serê xênî cilê zilê m, pê ta êgir, keviya bê n.

Têgiheştin:

Weke ko binê wana bi xîşkdanê hatî nîşankirin, navên rista yekemîn tîpa 'a' sitandin e.

Navên rista yekemîn di rista duyemîn de navin veçetandin e, aş navê cok, xanî ser, zilam cil, agir pê t, ban navê kevi veçetandin e.

Di vê veçetandinê de, weke ko di rista duyemîn de binê wana bi xîşkdanê hatî nîşankirin, dengê wûşa î "a" xwe guhertin e, vergerîyane dengê 'ê'.

Navê veçetandî tîpa 'ê' û "a" sitandin e.

Nîşe: cilê zilê m, pê ta êgir.

Xwîya ye ko navê veçetandî tîpa 'a' û 'ê' sitandin e. Ev tîp tîpê veçetandekê ne. Ji alîkî din ve navê veçetandî bi sitandina tîpa 'a' zayenda xwe yî mê, bi sitandina tîpa "ê" zayenda xwe yî nêr nîşan dîkin.

3-Xweguhertina dengê denga bi bernavan:

1.Xweguhertina dengê 'a' bi dengê "ê"

Nîşe

1. sewal, welat, dewar, bajar,

kalan, aş, ba, canî, zilam, agir, ban.

2.Ji, li, bi, di.

3. a- Ji sewêl, ji welêt, ji dewêr, ji bajêr, ji kalên, ji êş, ji bê, ji xênî ji zilê m, ji êgir, ji bê n.

b- li sewêl, li welêt, li dewêr, li bajêr, li kalên li êş, li bê, li xênî, li zilê m, li êgir, li bê n.

c- bi sewêl, bi welêt, bi dewêr, bi bajêr, bi kalên, bi êş, bi bê, bi xênî, bi zilê m, bi êgir, bi bê n

d- di sewêl, di welêt, di dewêr, di bajêr, di kalên, di êş, di bê, di xênî, di zilê m, di êgir, di bê n

Têgiheştin:

Weke ko binê wana bi xîşkdanê hatî nîşankirin, navên rista yekemîn tîpa 'a' standî ne.

Navên rista yekemîn di rista sêyemîn de bernavên rista duyemîn sitandin e.

Bi sitandina bernavên rista duyemîn weke ko di rista sêyemîn de binê wana bi xîşkdanê hatî nîşankirin, navên rista yekemîn di rista sêyemîn de dengê xwe yî "a" guhertin e, vergerîyana dengê "ê".

Xwîya ye ko bi standina bernavan navin dengê xwe yî "a" bi dengê 'ê' re diguherê nin.

#### 4- KURTBÛYINA WÛŞA

Di sedema ketina denga de me dîtibû ko wûşen kurt dibin. Ev kurtbûn ne kurtbûyîna wûşa xerabûna wûşa ye û di zimanê nivîsandinê de bikar nayên. Dîsa di sedema ketina endamekî wûşa de jî wûşen kurt bibûn. Ev kurtbûn jî nagihêjî zimanê nivîsandinê. Di zimanê axaftinê de dimînî. Lê ne wûşeyê xerabûyî ne.

Ev sedem şanî me didî ko wûşen bitenê di zimanê axaftinê de kurt dibin. Hin jî wûşa him di zimanê nivîsandinê de kurt dibin. Me kurtbûyîna wûşa bi

ketina endamekî wûşê î di zimanê axaftinê de li jor dabû. Emê li vir ser wûşeyê kurtbûyî di zimanê axaftin û nivîsandinê de birawestin.

Em kurtbûyîna wûşa di texlîte bernavan de dibînin. Bernav li cihna de jî di teherekî kurtbûyî derdikevin ber me. Di vê kurtbûyîne de bernav sipartina xwe diguherê nî, diwergêrî sipartina cihna. Sipartina cihna 'zami'r' pê k tînin.

Nîşe:

1-jê: kurtbûyîna ji wê an ji wî. Dîbî "jê".

2-lê: kurtbûyîna li wê an li wî. Dîbî "lê".

3 pê kurtbûyîna bi wê an bi wî. Dîbî "pê".

4- tê: kurtbûyîna di wê an di wî. Dîbî "tê".

5 jêda/de: kurtbûyîna ji wê de an ji wî de. Dîbî "jêda/de".

6- jêve: kurtbûyîna ji wê ve an ji wî ve. Dîbî "jêve".

7 jêra/re: kurtbûyîna ji wê ra an ji wî ra. Dîbî "jêra/re".

8-lêde: kurtbûyîna li wê de an li wî de. Dîbî "lêde".

9-pêda/de: kurtbûyîna bi wê de an bi wî de. Dîbî "pêda".

10-pêve: kurtbûyîna bi wê ve an bi wî ve. Dîbî "pêve".

11-pêra: kurtbûyîna bi wê ra an bi wî ra, Dîbî "pêra".

12-têde: kurtbûyîna di wê de an di wî de. Dîbî "têde".

13-têve: kurtbûyîna di wê ve an di wî ve. Dîbî "têve".

14-têra: kurtbûyîna di wê ra an di wî ra. Dîbî "têra".

NEXWE:

Weke ko li jor hatî berxistin bernavên "ji", "li", "bi", "û", "di" di kurtbûyîne de tîpê xwe yî "i" diavêjin, tîpa "ê" disitênin.

Bernavên kurtbûyî î jê, lê, pê, tê, di vê kurtbûyîne de paşdanî ye hevbendî î 'de', 've', 'ra' disitênin. Bi vê sitandinê ev bernav bi ti awayî ji hev naveçtin. Bi hev ve tînin nivîsandin.

# BIRINDAR Û ÇAVÊŞ - 2

Hirço ji nişka va ji şûna xwe rabû, goşeyê diwar çerx bû û hêla zilgo va çû. Birindar çûna Hirço meraq kir û wi ji da dî. Dema ku Birindar çend gav avê t şûnda di ku bavê wi li hember e. Hirço ji li nik dihat. Birindar pîr dil xweş bû kû bavê wi hat malê. Dî desteki bavê wi da destmalek tiji balicanên sor, isot, encûr û pivaz hebû. Dî destê dî da ji tîlayek ji darê bihayê jêrkîri hebû Birindar hema xwe gihand bavê xwe û jê re got.

- Bawo, ez bawer dikim ku tu i-roj zû ji nav bistan hati.

-Belê raste, ji bo ku min bira te kir luma ez zû hatim. Û min ji te re tîlaki biha ji ani kû ji te re tutik çêkim.

Dîlê Birindar pîr şa bû. Xwe bi bavê xwe va zeliqand, bi her dî destên xwe.

welat gazi Zelalê kir..

-Te hin dew temam nekiya(av neda) Zelal?

-Heya ku te destên xwe şuştim û piçeki vêsî şûnda ez diqedinim. Zelalê gotma xwe qedand şûnda desteki xwe ji bavê xwe re hêlikir(leqand). Hema mê bistê de Gulistan ji devê axur derdiket hewşê. Dî ku mênîkê xwe ji ji nav bistan(baxçe)hatiye.

Gulistanê destmala dest mênîkê xwe jê stend û rewşa bistan pîrskir.

-Bistan çawa ne isal?

-Bacan baş in, lê encûr hin pîr hûrik in. Ez bawer dikim di be ku ji kêmbûna avê ye, biçûkmayîna encûran. Eger ku tîr av vevê xun yê biçûk biminim. Bistan

piçek kulan ji dixwaze. Dîbê, ez çend rojan şûnda herim çezê ba hesingerê me û kulbîkeki nuh bîkirim. weha nebe ez bistan bi çî bî kulim?

Zelalê tepsîya mezîm û fireh, minderek dabû ser cilê mezîm ku li ser erdê li hêyatê rêxistibû. Çay, rûnê nîvîşk, nanê teze tev balcan û encûr dabû ser tepsiyê. Welat ji Birindar re digot: bixwe ku tu mezîm bibi, alikariya bavê xwe biki Zelalê ji hêdi hêdi dixwar. Gulistanê run bi xwê dikir li hindir. Dura dikir vê û bixwe. Bist û yek malbat li gund dîman. Mala bist û yeka yê şivanê gund bû. Şivan, ji jîna xwe şûnda bi tenê mabû. Salê şivan hin çel(çil)sal bû. Jîna(pireka) şivan demek dirêj nexweş ketibû. Lê dema sîftê(pêşiyê, ewil) nîkarîbûn herim doxtor. Hoya giring ji rewşa abori bû. Ji bo ku cara sîftê şivan bê dîrav bû. Taliyê wê dîbin doxtor. Şivan(Soro) beri ku jîna xwe ya bist û çar salî, Bêrivanê bibe doxtor, diçe ji ciranê xwe Sidar çend dîrava dêhn dike.

Doxtor navê çend dermana(ila-can) li ser kaxîzekê dimise. Dûra dîbê ew dermana ji dermanxanê bîkirim û bila jîna te wan bîkar bine. Bêrivan dikeve ciyan. Bi şev û roj dibe nale nala wê. Gelek xu dîde. Ne bi şev û ne ji bi roj dikare bikeve xewê. Soro gelek ji jîna xwe hes dikir. Gelek alikariya jîna xwe ya çeleng delal dikir.

Rojek ji rojên payizê, rojek bi baran û mij, Bêrivanê dikim bin axa reş(gorê).

## Ahmet Cantekin

Gundê Birindar berçiya, li ser greki weka piştî kûsi bû. Kaniya gund li rojavayê gund diket. Kani ne kaniyek pîr şen bû. Lê idara xwe pê dikirin. Li pêşiya kaniyê gundiya bi xwe hewşek piçûk çê kiribûn kû him dewar tî da av vexwin û him ji bi ava hewzê bistanên xwe av bîdî.

Dî nav gund dî bê sê daran çet dar tunebûn. Hêşinayi ji tunebûn. Rojhelata gund çihê bêdera bû. Çihê bêderên axê ji li bakûra gund bû. Çend gav ji bêderan yê li rojhilat şûnda çend rez hebûn. Ji reza şûnda ji gêli û daristan bû. Li rojavayê gund ji, bê dorhêlê kaniyê û bistanan, hem rez û hem ji gelek darên beheyva fêkiya, tuya, gûza û hêjira hebûn.


Bakûrê gund bi bêderê axê destpê dikir û dûzek fireh û dirêj domdikir. Çend kilometre şûnda çiyayên bilind xwe wek diwaran rêz kiribûn.

Başûrê gund tiji zilgo bû. Ji zilgî şûnda serjêrek hebû, ku he-ta çem dom dikir. Dî mabûna gund û çem da, darên qewaxê, bistan û gêli wek ketim nav hev dihat xabûnê.

Nivroj bû. Gundê Berçiya li ber rojê dikeliya.

Birindar kîşdikir mênîkê ku dihatin ser ruyê xwe.

Dûmahik heye



## HUMERÊN BÛKÊ

*Mecit Dersimi*

Kal û pirê kurda hatin ciheki an dî malek de kom bûn, tiştên ku hatine guhên wan, xewnên ku ditne ji hevra dibêjin û li ser wan û ên din gotûbêjek germ û dirêj pêk tê. Ew, derheqê bûyere, an kirinek de yekser biryara xwe bi heşki nabêjin û bi mesel û petelokan ve pîrsa pêşî vedikolînin. Paş axaftinek kûr û dirêj biryara xwe diyar dikin. Kesên ku nikarin li ser bûyere, an rûdayek rê bîdîn mesel û pêkanîna, ew xam û nezan tîn hesibandî, sohbeta wan bê tam û bê berhem e. Civatê de rê nadî mîrovên evto pîr bîpeyvî û hîzûra wan bîbîn. Lê ev ji disa bi hîşki û dîşkandî nabe. Tedît ku kalek meseleke vekir û cehê la dengê xwe birî.

Rojek ji rojan disa kalên me dî malek de civiyabûn çala mîrovên berê û derd û kulên xwe dikirin. Dor hatibû xaniçêkirna çirane. Ûso, dixwest ku ji xwe re qonaxek xweşik çê bike û dest pê kiribû ji. Himên wê hatibûn avêtin û hêdi hêdi dîwar bilind dibûn. Lê Ûso dexwest ku yek ji bo pez-dewarê xwe çê

bike. Hin paga qonaxê nivî nebûbû, ku Ûso destpêkir goma pez. Vêga kar giran bû. Ûso dî bin de ma. Perê wi, dar û kevîrên wi, têrê nekîr û her tişt mehtel bû.


Dî vê civatê de rewşa Ûso û mîrovên wek Ûso bi vê meselê ve hate şirovekirin.

Malek ji kurê xwe re keçîkek aniye. Çend roj dawet û dilan kirîne û paşt şeva yekemin sibe zû jinên der û cirana dî mala xwesûyê de kom bûne û çavronitî lê kirîne, ji zavê û bûkê re qayîliyên xwe diyarkirîne. Xêr û xweşiya bûkê û zavê dest avêtîne kîlam û strana, şayi pêkhatîye. Şirqa şirkqa jma çaraliyên malê girt û derve ji dihate bihustîna Hinekan digotin, 'Xwedê ji we re bîhêle. Ji her qeda-bela bîparêzîne. Bûkek pîr xweşik û delal e.' Hinekan ji digotin, 'Ke çîka malek dinyadîtî û xanedan e. Dê û xaltiyên wê ji bî rasti ciwanîk in. Rabûn û rûniştîna wan ji jinên Kurda re nîmûne ye...û hwd.'

Bî van gotînen xweş û baş ve bûk gelek kêfxweş bû. Bî qedr û

qîmetek mezin ve rûberu bûbû. Her çû rih û hînavên wê xav û sest bûn ji kontrolê derketin. Xaftîlan deng bî bûkê ket wek melodiyek tij û zirav dî nav odê de belav bû. Bûk vecinîqî û şaş ma; lê carek tir ji kevanê der ketibû, wê yê çî bîkîra Demek pîr kûrt de cîmaet ket bê dengiyê. Lê pîr nekîşand pîrçîni bî jîna ket û kena fetîsin. Xwesû, Pîr şermîzar û xemgîn bû. Hîmber vê rûşîya wê yê çî bîgota? Lê nîhêri ku gîş jîm dîkenî wê ji dest bî kena kir.

Çavên bûke bî ruyê xwesûyê ve mabûn. Dît ku kêfa xwesûyê ji pê hatiyê û şirqa şirqa wê ye, şerma bûkê revî û bawerî pê hat ku kirinek baş kirîye. Xwest ku vê rewş û hewayê kêr bine û rûmeta xwe hêtir bilind bike. Xwe gori xwesûyê û got - 'Dayê can! Yekê dîm ji bîkîm? Xwesû bî rasti şaş ma û aqlê wê ketibû delavek pîr teng. Lê wê yê bersîvek bîdaya tiştê bigota. Dereng nema û da: - 'Bûka mîn a delal! Ewek te kirîye carek, wê bî serî û bî çav bike. Ê dîm bîmine paşe!''





## DI 4.SALÊN 12'Ê ILONÊ DE

Dî ser 12'ê Ilonê, hatina cûnta faşist ra 4 sal derbasbû. Dî nav van çar salan da, zulm û terora faşizmê, wek ewreki reş dî ser welatê me da girt. Gelê Tirk û Kurd jî van rojên tari gelek tişt hin bûn. Jî ber ku karîna faşist xên jî birçibûn, belengazi û kuştinê tu tiştêki din neani bî xwe ra.

Dema em jî nêzikva li van çar salên buhuri mêze bikin, emê bibinin ku yê n welatê me firotine emperyalizma Emerika, Tirkîyê anîne nav kijan rewşê.

Dema cûntayê dest dani ser hukum, derew kir û got "wê pêşiya terorê bigrim". Lê cûntayê bî destê dewletê, xwinxwari û teroreke nediti li ser gelên me ajot.

--- Jî sedhezari (100.000) zê detir kes, jî ber ramanên siyasi avê tin zindanan. Girtigeh bûne çiyê usa ku têda kesên şoreşger welatparêz û demokrat bî komi hatin qetînkirin. Dî şeşê çirê ya paşin sala 1984 an da li girtiheha Diyarbekirê, ew êrişên ku li welatparêzan û şoreşgerê Kurd hate kirin, û yê n ku li wir hatin kuştin, û her ûsa yê n ku li girtigehên Metris û Mamakê, dî berxwedanên xwe birçî hêştine da can dane, iro jî dî bira me da ne.

--- Jî 12'ê Ilonê 1980 ê vir da, hejmara yê n ku bî îxdamê têne dadmendin gihîştê 500 kesî. U yê n ku bî îxdamê hatine cezakirin 693 kes û yê n ku cezayê wan ê n îxdamê hatine birin 138 kesin.

--- Dî navbera 1980 1984'an da: li nivîskar, verger û kesên hunervan ra li ser hev 316 sal û 4 meh ceza hatine birin. Cûnta faşist sansorekê usa hişk bikartine ku heta rojnamên burjuva jî jî terora faşist para xwe girtin. Rojnamên burjuva wek Hurriyet Milliyet û Gunaydin li ser hev 7 caran û 68 caran hatin girtin.

--- Gelek rêxistinên siyasi, DISK, TÖB-DER, Komela Aşitiyê, Rêxistinên Jinan û gelekên mayin hatin girtin û qedexekirin. Li serok serwer û endamên wan cezayê n giran birin û ew dî eşkenceyan ra derbaskirin.

--- Tenê jî ber ku 1399 ronakbiran ditinên xwe li ser daxwaznemeyeki pêşkêşkirin û imza xwe danine ser, jî 56 kesan ra, jî 3 mehan heta saleki ceza têne xwestin.

--- Cûnta faşist bî xulamî, liber daxwaz û direktifên Emrikayê stuyê xwe xwar dîke. Usa dixuye ku Cûnta faşist û hukumeta wan, li ser daxwaza Reagan, bona bicihkirina roketên mîrînê li ser erdê welatê me wê qebûl bikin.

--- Kurdistan a Tirkîyê wek "Navça Serbest" hate êlankirin ku dewlemendiyê n sererd û bînerd jî aliyê Holdingan va bê talankirin.

--- Li ser gelê Kurd zordestiya xwinxwar dî ser tixûban ra jî derbas dibe. Cûnta faşist li Rohilata Navin wezîfê cendirmetiye dewletên Emerika Yekbûyi digre ser milê xwe, li dîji şerê azadiyê gelê Kurd jî bo komi tunekirina gelê Kurd dest bî seferên xaçî dîke. Vê dawiyê disa leşkerê Tirk, li ser daxwaziya rejîmê n paşverû yê n Iraq û Iranê, 18-20km. ketine nav erdê Kurdistan'a Iraqê.

--- Cûnta faşist çawa jî aliyêki va xwinmijandinê bî kartine usa jî bî terora abori, civaki gelên me mehkûmî birçibûnê dîke

--- Jî 12'ê Ilonê virda, qimeta ucretan jî bo kirinê %50 berjêrtir bû.

--- Dî nav çar salan da, hejmara resmî ya bêkaran jî 2 milyan 400 hezaran gihîştê 3.5 milyon.

--- Dî bazirgani ya derekêda, kontrol jî sektora dewletê hate standin û kete destê 15-20 holdingan. Deynê n derva gihîştê 28 milyar û Tirkîyê dî nav dewlete n deynan da cihe / digre.

--- Dî Sebat 1984'an da, bihayê n tiştên xwarinê jî sedî 286-530 bîlîn bû.

--- Li ser peymanê F-16 ku bî Emerika ra hatiya çêkirin, mesrefên leşkerî yê n Tirkîyê gihîştê 124 milyar û 650 milyon.

--- Dî warê exlaqî da jî, xirabiyê n mezî n dî civatê da pêktên. Ticareta jinan, kedxwayiya li ser zarakan gihîştîyê dereceki gelek bilind.

Rêya ku iro Tirkîyê tê dayê, ber bî felaketên hin mezintir diçe: Li dîji vê rewşa xirab, çare ewe ku hemû rêxistin û kesên pêşverû û şoreşger hêzên xwe bikin yek û li dîji faşizmê şerbikin.

Lema dî vê xebatê da:

--- Li dîji îxdamê eşkence û kuştinê n cûnta faşist,

--- Jî bo vebûna hemû rêxistinên siyasi yê n anti-faşist û serbestiya xebata wan,

--- Jî bo azadiya girtiyayên siyasi jî zindanên cûntayê û efûkeyê gihîştî.

--- Li dîji zordestiya nijadperest, şoven û asimilekirina li ser gelê Kurd,

--- Dî serida emperyalizma dewletên Emerika Yekbûyi (DAY) derxistina hemû hêzên emperyalist jî welatên me

--- Jî bo nan azadi û aşitiyê,

--- Jî bo hilweşandina sazûmana faşist.

Divê em piştigiriyê bîdine tevgera gelê Tirk û Kurd li welat.

**EM DENGÊN XWE BILINDKIN LI DJÎ FAŞİZMÊ!**

12'ê Ilonê 1984 roja çarşemê li Sergelstorg-Stockholm, em dî miting û meşa protestoyê li dîji cûnta faşist da beşdarbin. Seet 17.30

**BIJÎ HEVKARÎ!**

**BIMRE FAŞİZM!** Federasyona Komelên Kurdistan, Emeğin Birliğı, İSTİB, Devrimci İşçi, Sosyalist Gazetesi, Tekoşin, Uppsala Kürt-Türk Halklarıyla Dayanışma Komitesi, Kurdistan Kultur Centrum İşçi Gerçeği, Roja Welat'la Dayanışma Komitesi.